Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

Çileyê Pêşîn / 1 - 12 - 2020 Kurdistan-Hejmar (186) www.pdk-s.com

# Qedexeyê rewşa welatiyan zehmetir kiriye

Kurdistan Çîmen Xidir



Li Hesekê û Qamişlo qedexeya çûnûhatinê ji bo rêgiriya li vayrosê korona hatiye ragehandin, û ev yek jî bûye cihê nerazîbûna xelkê deverê ji ber ku rewşa wan ya abûrî gelekî xerab bûye, û bi ragehandina qedexeyê rewş zehmetir bûye. Cuma dibêje, berya destpêkirina qedexeya li dukan û nanxane û li her deverekî qerebalixiyeke zêde çê bû, û tekez bi vê yekê rewş zehmetir dibe, qedexeya hatiye ragehandin rewşa abûriya xelkê zehmetir dike û dihêle ku bêhtir birçî bibin.

Yasmîn jî dibêje, bi ragehandina qedexeyê qerebalix zêdetir dibe, lewma çareseriya herî baş ji bo rêgirtin li vî vayrosî tûndkirina rêkaran û ji wan jî lixwekirina neçarî ya maskan û qedexekirina şahî û şînî û kombûnan wê demê dê rewş baştir bibe, û dê qwrebalixî kêm bibe.Kamîran jî dibêje, bi rastî heqê nanê rojane bi me re nîne û vê yekê rewşa me zehmetir kiriye, û bi hezaran malbatên bê pere hene û nikarin xwe û zarokên xwe xwedî bikin, vê qedexeyê rewşa xelkê zehmetir kiriye.

# Yekrêzî li Kurdistana Sûriyê û hêviyên xelkê

Kurdistan - Canda Ebdula



Ev demeke behsa avêtina pêngavên baş ji bo prosêsa danûstandinên di navbera Encûmena Niştîmaniya Kurdî ENKS û Partiyên Yekîtiya Niştîmanî tê kirin, lê heta niha li ser erdê ti encamên praktîkî yên van danûstandinan nîne û xelkê Kurdistana Sûriyê li hêviya wê yekê ne ku ev danûstandin bighên encamên baş da ku rewşa wan ya rojane baş bibe û hêviyên wan bicih werin.

Îmad Xidir li ser vê mijarê wiha dibêje, danûstandinên Kurdî Kurdî li pêwîstiyeke û giringiyekê ji bo tevahiya gelê Kurd li Kurdistana Sûriyê ji ber ku bi pêkanîna yekrêziyê rewşa deverê gelekî xweş dibe û xelkê me ji êş û azaran rizgar dibin, lewma divê pêngavên cîbicîkirina qonaxên yekrêziyê lez têde were kirin û ti alî vê dozê piştguh neke, ji ber ku bi piştgukirina mijara yekrêziyê dê karesatek li ser deverên Kurdî de were mîna Efrîn û deverên din yên Kurdî, ez dikarim bêjim ku ev mijar erkekî niştîmanî ye û nabe ti alî yan kesek xwe jê birevîne.

Cemîl Mihemed wiha dibêje, PYD û partiyên ser bi wê ve bi biryara PKK xwe ji danûstandinan direvînin û ew naxwazin ev danûstandin bighên serî ji ber ku sûdê jê dibînin, PKK destêwerdanê di nava karûbarê Kurdistana Sûriyê de dike û dixwaze her tişt di bin destê wê de be, ji ber ku bi serkeftina van danûstandinan dê nanê PKKê li Kurdistana Sûriyê namîne û nikare bi keyfa xwe bazirganî û çûnûhatina xwe bike, lewma divê Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKS bi hemû hêza xwe hewla serkeftina van danûstandinan bike daku rê li ber xerabûna rewşê bigre, û êdî welatiyên me rewşa wan xweş bibe, û jiyaneke xweş birêve bibin.

Jiyan Omran wiha li ser vê mijarê dibêje, giringiyeke zêde ya danûstandinan de heye û xelk li hêviya van danûstandinan e, lewma divê ev delîveya zêrîn bê bidestxistin û jidest neçe ji ber ku heger ji dest biçe nema bi hêsanî vedgere. Bi Yekrêziyê dê rê li ber wî aliyê ku nahêle yekrêzî biçe serî were girtin, û nema dikarin bi tena serê xwe deverê birêve bibin. ENKS li ser van danûstandinan cidî ye, lê aliyên din bi necîbicîkirina xalên hatine eşkerekirin xwe direvîne û ji xelkê û raya giştî re diyar e ku kîjan alî xwe direvîne, berî niha wan xwe ji çend rêkeftina dane aliyekî mîna rêkeftinên Hewlêr û Duhokê.

# Tawana gundê Kîmarê ne mirovane ye

Kurdistan-Bidûvçûn

27ê Mijdara 2020an, gundê Kîmarê yê navçeya Şêrawa ya herêma Efrînê li ser tawanek hovane di dermafê sê welatiyên sivîl yê kurd hişyar bû, ku ew hersê welatî li ser destê PKKê hatin terorkirin, du ji wan şehîd bûn yek ji wan birîndar bû.

Tawan demijmêr 10 sibê bû, û girûpek ji PKKê derbasî gundê Kîmarê bû, û her yek ji çotkarê nûciwan Hemo Cengîz Necar ku 16 salî ye, û şivanê bitemen Ebdulrehman Hemo 75 salî bi şêweyekî hovane dane ber lêdan û eşkenceyê û bi dehan fîşekan şehîd kirin. Welatiyê bi navê bi Mesûd Mecîd Cimo birîndar bû ku hersê welatî sivîl in, û şivantî, û karê çotkariyê dikirin.

Şamîran Necar apê şehîdê kurd Hemo Necar ji ARKê re behsa hûrguliyan kir û tekez kir biraziyê wî û welatiyê bitemen, ji aliyê PKKê ve hat terorkirin.

Ji aliyê xwe ve rêxistina mafê mirovan li Efrînê ew tawana bi destê PKKê piştrast kir û got grûpek ser bi rêjîma Sûriyê bi navê hêzên rizgarkirin Efrînê yên li gundê Soxanekê dimînin, di rêya geliyê Lolik, yê navbera Kîmar û Kurzêlê de derbasî gundên di bin destê Turkiyê de bû bi buhaneya ku li Cebel Elehlam, operasyon encam bidin, lê li şûna operasyonê ew tawan di dermafê hersê welatiyên kurd de encamdan.

Heman rêxistinê tekez kir ku Ciwanê kurd Mesûd Cimo, piştî dengê fîşekan bihîst, karîbû bireve, û lê bi çavê xwe bû dîdevan û bînerê û şahidhalê tawana bi destê YPGê yan hêzên rizgarkirina Efrînê hatiye encamdan.

Her di vê derbarê de raweneha Sûriyê ya mafê mirovan anî ziman ku tawan bi destê hêzên kurdî hatiye encamdan, û nûciwanê kurd Hemo bi tundî hatiye eşkencedan û bi 40 fîşekî, hatiye kuştin herwiha guleyên bêserûber çotkarên kurd armanc kirin.

Piştî tawanê di dermafê sivîlên kurd de alavên PKKê û PYDê yên rojnamegeriyê nûçe bi bervajî belav kirin û tomet arastî Turkiyê û girûpên çete kir.

Lê apê yek ji qurbaniyan, rewangeha Sûriyê ya mafê mirovan , û rêxistina mafê mirovan, encûmena sivîl ya Efrînê û çalakvan û rojnamevanên Efrînê tekez kirin ku tawan bi destê çekdarin kurd hatiye encamdan, û ew yek ji kîn û zikreşiyê hatiye.





# Siyaseta sist û pandemiya Corona



Mahir Hesen



Rewşa diniyayê di giravekî buye û lihev ketiye , sedem jî PANDEMIYA corona ye .li kurdistana sûrî bi zelalî rêjeya kesên ku ji ber tûjbûna bi corona , canê xwe ji dest dane were saz kirin tune . Hê jî gelek pirsên neçareserkirî hene. Ango rêveberina krîzê di bin desthilatdariya apoçiya rêkûpêk bo belavbûna domdar a vîrusê kêm bike ,hatiye piştguh xistin.

Tê destnîşankirin ku axaftina apoçiyên rojavayê welêt teqes dike ku baweriya bi ramanê ocelan wa ji pandemiya corona diparêze, başkirin bi kar û kiriyarên pkk ve girêdayî ye, an jî bilindkirina wêneyê ocelan ji xwe re kirine ziyaretgehek pîroz, wekî ku em di finasên pyd ê de dibînin.

Ev helwesteke negatîf a li hember Pandemeya corona û erêkirina tedbîrên pêşîlêgirtinê nake . Mijar li vir nabe ku bi dilrehetî em li ser gengeşa bikin , ji miletê me tê xwestin bawerî û baweriyên saxlem e ku baweriyê bi xwe wekî dermanê tendurist bibîne, û parastina xwe di van baweriyan de bi hişê zanistî û destkeftiyên geş ji re rûbirûyek eşkere bike, lê belê bêtir bi malbata xwe ve xemxwar bin . Zanibin , ku qedexekirina xwepêşedana û rawestandina wan desthilatiya apoçiye naşopînin , ya giring ew e wêneyê ocelan bilind bikin . ramînê pkk di dîrokê de serdest nebuye, û fermanênên wa yên dabeş bi dagirkerên niştîman re , nîşan bide. Belaya hînkirina apoçiyetê îro ev e , ku bi hişekî kevnare de miletê me girtî bimîne , bêyî ku hewl bide li ser piya rawestin û xwe bi rastiyê ve dakêşîne, yan jî bi xwendin û têgihiştinê welat bi dest xwe bixin, û ew bi zanebûna serdemê re dîsa werin fêr kirin.

Ji bo ku merov ji nakokiyên heyî yên pkk fêhm bike, hewce ye ku merov vegere ser zihnetiya xêrnexwazin kurda , ji ber ku li vir hiş û ramanê wa bi hevre têkildar in.


Çima min wisa got ?! Ez ê nimûnekê tenê bînim, heya ku hûn cûdahiyê bibînin di navbera hukûmetên ku li ser gelê xwe ditirsin û ji yên ku bûne bela û ketine stuyê Kurdan Wezareta Tenduristiyê ya elmana Federal li ser malpera xwe bi berdewamî agahdariya der barê Coronavirus de nû dike, û Navenda Federal ya Perwerdehiya Tenduristiyê di heman demê de li ser malpera xwe bersivên pirsên ku pir caran têne pirsîn di derheqê virusê korona derketî de dide.

pîlana pkk li ser welatên me ku tu carî nahêlin ew biryara xweya serbixwe biparêzin. Armanc , tê wateya ketina xizmeta rêjîma sûrî , ji bo ku pydê bike karmend bo berjewendiyê bass , û wê bikar bîne da ku nakokiyan ji kurdan re çêbikin , û ji nav civakê bixebite da ku armancên êrişker ên dijî Netewparêz û niştîmanperwer kar bike.

Pirsa ku ez dixwazim bikim ev e: Çawa hemî hewildanên kûr li dijî welatên me , yên ku tê xwestin milet ji hevbixin û wî telewele bikin , didomin, an jî pêşveçûna hestê netewî li binxetê sînor bikin, û her wiha tevgera rizgariya kurdistana sûrî biguhezîne bi rengek ji bo siyaseta pkk re xizmetê bike . bersîv , pêşî li veguherîna dîrokî bigire. Em gişt li pey cîhaneke nûve , û di siyaset û binyata xwe de , li pey diçin?

heke PYDê di tirsa kurdan de bin , wisa siyasetmedarên wan ji van hemî pîlanên şeytanokî re yên ku hewil didin ku hevsengiya hêzê di berjewendiya pkk vegerînin çavmiç û gor nedibûn.

# Giringiya Parlemana Kurdistanê



Emer Îsmayîl

Bi,Bireyarek Kurdistanî bi ser perştîya serok berzanî di Meha 12an sala 1991an serkirdeya PDK,YNK û 8 partiyên din biryara damezrandina parlementoya kurdistanê dan.Piştî hilbijartina 04.06.1992 de parlementoya kurdistanê yekemîn runiştina xwe pêk hanîn.2003 Piştî hilweşandina desthilatdariya partiya baas Sedam Huseyin 30.12.2005 de bi refrandom Qanuna bingehiya iraq a nûh de Dewleta iraq a federal hat bi navkirin, herwiha herêma başûrê kurdistanê federal Navnetewî hat qebûlkirin.

25.09.2017 de rêvebiriya herêma başûrê kurdistanê bi proseya demokratik rewa ji hemwelatîyên kurdistanê bi pirsa hûn serxwebûna kurdistanê dixwazin ? referandom pêkhanînin, encamên referanduma serxwebûna kurdistanê di sindoqên dengdanade ji % 93 gotin Erê.Em mafê dewletbuna kurdistanê dixwazên.

Bi ev lêpîrsîna referandumê di dîroka kurdistanê de cara yekemîn bi encamê daxwaza rewa meşrû navxwe û navnetewî de zelal bû belge.

Wateya encama referandum a 25.09.2017 eve ! Ji bilî daxwaza serxwebûna kurdistanê tu nerînên kesa ,girûpa ,komele û partiya ne meşrû ye.Lê herêma kurdistanê Parlemento,Al,hêza parastina kurdistanê Pêşmerge,Hukumet, Serokatiya Herêm û Asayişa Civaka herêma kurdistanê di iraq federalî de yasaya Navnetewî de ,xwedî Statuya meşrû federal heye.Jibona damezrandina dewletbûna kurdistanê ji hila desthilat dariya meşrû bizavên diplomatik berdewam dike.

Em dilsozên rêbaza barzanî dibin ala kurdistanê de vê xebatê berdewam dikin



# Jina Kurd
# 25ê Mijdarê bêdengiya xwe dişkîne



Emel Hesen

Kampanya li seranserê cîhanê her sal di 25ê Mijdarê de - ku Roja Navneteweyî ya Têkoşîna li dijî lenceîdeta li dijî Jinan e - dest pê dike û ta bighe 10ê Çilê pêşî de - Roja Mafên Mirovan a Navneteweyî - diqede ji bo ku tundiya li dijî jinan û mafên mirovan ji nêz ve were girêdan û tekez kirin ku ev tundûtûjî binpêkirina mafên mirovan e .Herwiha her sal ji meha Mijdarê ve, kampanya li dijî şîdeta li dijî jinan dest pê dike, û armanc ev e ku girîngtirîn destkeft û pêşveçûnên ku jin di jiyanê de gihîştine hevûdu, hişmendiya di nav civakê de belav bike, di hemî kovaran de piştgiriya manewî û psîkolojîk ji jinan re peyda bike, pirsgirêkên di navbera jinên berê ya kefnar û jinên hemdem de nîşan bide, û gavên erênî di astengiyên malbatê de binirxîne Hon rêzgirtina jina nûjen ku karibû serê xwe hilde û li hemberî civakê bisekine û meşa jiyanê li hember wê dijwarî li ber xwe bide û têkoşîn û berxwedan kir da ku bigihîje tişta ku dixwest. Wê bêdengiya xwe şikand, ya ku wê bi rêgez û kevneşopiyên derewîn dida darizandin da ku wê ji mafên xweyên herî bingehîn bêpar bike dema ku jin bû qurban di wê civakê de, her kes bû Ew di her warî de, mîna lêdan, heqaret, rûreşkirin, bêbextî, zor, bêparhiştin ji xwendinê, mîrat, sunetkirin ... hwd bi qedera wê re dilîze. Di wan demên ku her kes jiyan û çarenûsa jina Kurd kontrol dikir lê, wê bêdengiya xwe şikand û li ser piyan sekinî û bixwe li hember çarenûsa xwe li ber xwe da, hemû dijwarî û trajedî destnîşan kir, û rola xwe di civakê de mîna zilamek lîst û bû bijîşk, endezyar, parêzer, mamoste, nivîskar, Rojnamevan, helbestvan, hunermend, siyasetmedar, pêşmerge û şervan, wek ku em îro dibînin, ew di hemî waran de roleke girîng dilîze û hazir û amedeye .Tevî sînga xwe ya germ, kaxeza dil xwe yê dilnizm, bi kahniya diovaniya xwe ya xwudayî, karîbû bidestê xweyî rastê dergoşê bihejîne û bidestê xweyî çepê Cîhan hejand ,hêjaye ku ew bi sirûd û çekên xweyên xemilandî welatê xwe xemiland û wê navê xwe bi tîpên zêrîn li rûpelên dîrokê tomar kir,

Lê mixabin tevî ev hemû geşedan û giyanê berxwedanê yê jina Kurd, û serfirazî û destkeftiyên ku jina Kurd bi dest xwe xistiye, ew giyana nerm, xwenda hîn jî qurbana civaka navneteweyî û rejîmên dîktator e, û li pêşberî pîlanên kuştinê yên herî qirêj li qada siyasî û li pişt perdeyên nerewa.

Dijminên doza gelê Kurd dijminiya xwe bi ( Laila Qasim) têr nebûn, û wan nefreta xwe ji jinên Kurd sax nekir, û tundûtûjî berdewam dike û şer berdewam e li dijî keç, hunermend, çalakvan û jinên Kurd li çar perçên Kurdistanê, di nav de Efrîna birîndar, ku milîşên ser bi artêşa Tirk kuştin û binpêkirinên herî hovane li dijî jinan. Ji ber vê yekê em şermezar û şermezar dikin,

Van tawanên hovane li dijî mirovahiyê, û em bang li dezgehên navneteweyî û rêxistinên mirovî dikin ku destêwerdanê bikin û bibînin ka li Efrînê çi dijî jinên Kurd diqewime, ma heya kengê jinên Kurd dê bibin qurbanê van êrîşan li ber çavên civaka navneteweyî? Çima ev bêdengiya navneteweyî ya ku li erdê diqewime? Where ew rêxistinên navneteweyî ku banga mafên jinan û parastina jinan ji êrişên Tirkiyê dikin li ku ne?!

Di dawiyê de: Çiqas cûrbecûr bin rêbazên îşkence, kuştin û kiryarên bê exlaq ên ku dijminên neteweya Kurd didin meşandin jî, jina Kurd dê dev ji tekoşîna xwe bernade, lê berevajî vê yekê, jinên Kurd ji bo bidestxistina mafên xwe û azadiya welatê xwe yê Kurd her ku diçe ji azadî û hezkirina xwe ya ji berxwedanê re hez dikin û dilsoz in..

## Daxê xefletê





Şiyar Alyanî

Heta ku me dewlet nebê
Kuştin wê tim behra me bê
ta ku me yek rêzî nebê
Agir wê li ber deryê me bê
şûrê wa li ser sukra me bê
vaya tofan li ser me tê
ji dest bernedin vê derfetê
em şiyar bin ji vê xifletê
zû şanebin bi vê lizetê hinek ji me ketne nimetê
di mihder û hicra muhbetê
lêv şêrîntirin ji şerbetê
ji bax û zeviyê cine tê
bihna énberê ji te tê
Giriyê xelkê bi halê me
tê bahoz û barn li ser me tê
vaye roja me ji wê ve tê
sohtim bi daxê xifletê Qey kolatî li bejna me tê
em bûn ardiwê firqetê
bûya Qedera me bi tenê
ji hev dûrkevin ji vê dinê

## Gul û Bilbil



Mesûm Bîco

Li wê dehla han .. ew dehla mezin
Darên şîn û geş .. kanîyek li bin

Bilbilek hebû .. gelek evîndar
Hebû gulek sor .. li şi,ra guhdar

Gul dev girtîbû .. bilbil dixwendî
Ew gul digirtî .. mabû li bendî

Gul jî wek bilbil .. bendî rojaye
Pir evîndarê .. wan helbesta ye

Lê bilbil ketî .. destek nêçîrvan
Gerzl lê girtî .. kirbû hêsîrvan

Ger maye hêsîr .. ji bîr nake gul
Tîrê evînê .. her dem têne dil

Rojê buharê .. bûrîn û bûrîn
Rengê gula sor .. bûye weke xwîn

Çavê xwe gerand .. bilbil ne dîtî
Baxê gul bûye .. agir û pêtî

Got piştî bilbil .. ez namînim geş
Rengê gul bûye .. rengê şeva reş

Pelik weşandin .. li binya darê
Rengê gul bûye .. rengê êvarê

Lê bilbil firî .. rojek hatî der
Li paş xwe hiştin .. ew kul û keder

Ji nûve hatî .. wê dehla mezin
Li gel gula xwe .. da bike gazin

Lê gul nedîtî .. li wî baxê reş
Hawêr meyzandî .. kanî gula geş

Wî pelik dîtin .. wane l,bin darê
Bi wan dilîze .. bayê êvarê

Bilbil firîbû .. gelek çûbû jor
Hatî ji kêrê .. tev bû xwîna sor

